


# BERBANG

KOVARA FEDERASYONA KOMELÊN KURDÎSTANÊ LI SWÊD



HEVAL CEWDET CÛ HEQÎYA XWE



## NAVEROK

Heval Cewdet.....	3
Dji şerê Iran û Iraq.....	4
Bersiva Wezareta Derva.....	5
Galileo Galilei.....	6
Dijmên Ziman.....	8
Kurdistan Spor.....	12
Jindariya Rojan.....	14
Bernama Hindekari.....	18
Birindar û Çavêş.....	19
Bêedebe.....	20
Peyvên Niviskarên Mezin.....	21

Berpirsiyar  
S. FERMAN

Pergala Rûpelan  
A. M. GILLY

Raxistina Nivisaran  
RÛŞEN

Redaksiyon  
KEYXUSRO SÎPAN  
BENGÎN BOTANÎ  
A. M. GILLY  
RÛŞEN FARQÎN

**B E R B A N G**  
Kurdisk tidskrift, utges av  
Kurdiska Riksförbundet. Ansv-  
arig utgivare och Redaktör:  
S. Ferman. Layout: A.M. Gilly.  
Sättning: Rûşen.

**A D R E S S**  
Kurdiska Riksförbundet,  
Tunnelgatan, 14, 3 tr.  
111 37 Stockholm/SWEDEN  
TEL : 08 / 11 23 42

Prenumerationsort: Medlemmar  
50.- kr/år. Övriga 100.- kr/år.  
Postgiro: 64 38 80-8

## XWENDEVANÊN HÊJA!

Hejmara Berbangê ya çuyin, 2/  
84 dî Hezêranê de bî destê we  
ket. Hejmara Berbangê ku dî  
destpêka 84 an de derketibû û  
weke 17/84 hatibû hejmarkirin  
ji pê rê kete destê we. Hejmara  
17 diyardeke, ku heta destpêka  
1984 an 17 hejmar Berbang der-  
ketibûn.

Lê berpirsiyariya Berbangê ya  
nû biryareke girt, ku weke kova-  
rên biyaniyên dîn, dî her salê  
de bî hejmar 1 destpêke.

Feyda wê eve, ku em alikariyê  
ji Sazgehên Biyaniyan (SÎV)  
distinin û ev alikariya angore hej-  
marên salekê tê hesapkirin.

Disa dî hejmara 2 /84 an de şa-  
şiyên me yê daktilyê hennin.  
Ji bo van şaşiyên me li me bi-  
borin.

Berbang

## B E R B A N G

Kovara Kurdi, Xwedî : Fede-  
rasyonê Komelên Kurdistanê  
li Swêd. Buha : 5 Kron, Abo-  
na salekê: 50 Kron, 30 DM.

## N A V N I Ş A N

Berbang, Tunnelgatan 14,3 tr.  
111 37 Stockholm/ Sweden.  
Tel : 08 / 11 23 42  
Postgiro : 64 38 80-8

# ME HEVAL CEWDET HUNDAKIR

Endamê Komita Karger û berpirsiyarê abori heval Cewdet, di 20 ê Heziranê de, hê 35 salî çû heqîya xwe.

Ev sala duwem bû, ku heval Cewdet di Komita Karger de, weki berpirsiyarê abori bi kar û barên Federasyonê radibû.

Cewdet ji ali her hevalên xwe ve di hate hîzkirin. Ew, miroveki welatparêz, dosteki dîlgem bû. Dan û Standmên wi bi hevalên wi yê welatparêz re gelek xurt bû.

Heval Cewdet, li gundeki kurda, li Celebê (grêdayiyê Kulu-Konya) hatibû dinê. Ew ji malbateke gelek xîzan bû. Her kesên ji malbata wan ji bo domandina jiyana royan, weke şivan, gavan, karker li ba dewlemendên gund xebitin.

Ew di sala 1976 an de li Swêd ciwar bû. Hê di destpêkê de bir û baweriyên welatparêzî pêre çêbû. Her çiqas çû peywendî û têkiliyên xwe bi hêz û kesên welatparêz û pêşverû re xurt kir. Di komelên kurdan de gelek aktif xebiti, Karê siyasi pêk ani.

Heval Cewdet, wan salên dawî-

yê, bi hêzkirî ne bû, kesek serbixwe bû. Lê tucar Peywendiyên xwe ji hêzên Kurdistanê re ne biri û di Federasyona Komelên Kurdistanê de, li kêleka wan cih girt, tevi xebata welatparêzî bû.

Hevalê me Cewdet, kurdê Anadolê bû, lê bi hemû malbata xwe ve hêji zîman û adetên gelê kurd muhazeze dikirin. Dîlê wan bi gelê kurd re bû û ew perçakê ji gelê xwe bûn. Ew, di nav nas û gundiyan xwe de ji bo destxistina mafê gelê kurd xebatek bê hempa pêk ani û bi her imkanên xwe va piştgiriya vê xebatê kir.

Heval Cewdet, tucar guhnedida dewlemendiyê. Ev yeka ji rewşa malbata wi xuya bû. Jiyaneke wi sade hebû, hiş û meylê wi li ser pere civandinê nebû.


Hiş û meylê wi li ser xebata wi ya welatparêziyê bû. Tîm dixwast serê xwe li ser pîrsa kurda bêşine, xebatên siyasi, welatparêzî û demokratik pêk bine.

Heval Cewdet ji nav me bar kir û çû. Lê tucar xebata wi ya hêja, bir û baweriyên wi yê welatparêzî namure.

Em tucar hevalê me Cewdet ji bir nakin.


*S. ferman*

# diji şeré eran û eraq



Rojî 16 mangî Jun le şari Stockholm xopişandanêk le layen Komitey Kurdistan û Fıdrasyoni Komele Kurdistanîyekan ew lê Swîd kıra, dji şeri Eran û Eraq bo mehkum kırdini bomba barani Kurdistan. Lem xopişandane da ke le katjimêr yeki Paşniwero le (Sergelstorg) ewe destipêkird zyatur le 300 kes beşdar bûn.

Şeri koneperistaney Eran û Eraq mawey çwar(4) sale berdewame. Lew şereda sedan hezar kes le xelki her dû wîlat bûnete qurbani syaseti koneperistaney em dû rijêmê. Le mawey em şereda deyan car şarekani Kurdistanî Eran û Eraq bombabaran kırawın, be hezaran reş û rût, pîrû minal kujrawın û bîrindar kırawın û derbedebûn.



Em şere nalabare cige le malwêrani derbederi w kuştın û bîrin hiç sûdêki key niyê bo gelani her dû wîlat.

Ragıtın û westani ew şere wêrankere, bote dirûşın w awati gelan ç hemû azadixwazani cihan .

Pêkhatini em xopişandane, bo mehkûm kırdini bombabarani Kurdistan û ragırtini şeri Eran û Eraq leheman katış da hawdenge le gel xelki Kurdistan û xelkani tır her dû wîlat.

Berew Kungstradgarden berê kewtın, ke be xwêndinewey wîtarêk kotayîyan pêhêna.

# BERSIVA KOMİSYONA WEZARETA DERVA A SWÊD

Dî hêjmarê çûyi de me mosyona VPK dî derheqa rewşa lî Tirkîyê, Îranê û kurda de pêşkêşê we kiribû.

Beriya ku ev pîrsana lî Parlamentoyê bê raberzandîne Komisyona Wezareta dervayê, bî beşdariya 16 endamên xwe va ev bersivê da Parlamentoyê û bû lîngeh jî bo raberzandîne. Endamê VPK yê dî vê komisyonê de Bertil Moberink, ne razibûna xwe bî vê bersivê pêşkêş kir. Daxwazên Moberink dî protokola Komisyonê de hat diyarkirin. Em herdu beşan jî pêşkêşê we dikin.

Tenê pîrsa lî ser kurdan jê tê weşandin.

## REWŞA KURDAN

Dî mosyonê de hatibû daxwazkirin, ku Parlamento bî pêşengiya hikumetê va pîrsa kurdan bibe Komisyona mafê mirovatiyê ya Yekitiya Neteweyan û dî planeke navnetewî de tedbiran bixwaze û xwepêşandînen alikariyê pêk bîne.

Me dî rapira xwe ya 1982/83 : 84 de ev pîrsa bî naverokeke weke viya diyarkiribû, ku Hukûmet lî her perçeki lîkolînê çêke ku ev zordestiyê tesbît bike, û bî kijan rê dê xebatê pêk bîne zelal bike. Komisyona disa diyar kiribû, ku Swêd ne endamê Komisyona mafê mirovatiya ya Yekitiya Neteweyan e.

Rapora me ya 18 1981/ 82: 7 de jî me diyar kir. ku alikariyêke navnetewî pêwîste, ger mirov bixwaze vê pîrsê bibe Yekitiya Neteweyan' Ne wulo be, ev yeka kareki pêk nayîne, dikare zîrarê lî bîne.

Komisyon tim dibêje, ku divê zordestiya lî ser kurdan dî planêke navnetewî de bê te diyar kirin. Zordestiya lî ser kurdan lî her perçeki ne wekhev e. usa

xuyaye, ku kurd lî Îranê dî rewşeki ne baş da ye. Jî bo alikariya kurdan kijan rê çêtîre divê jî alî hikumetê lî angori her rewşeki taybetî bê tespît kirin.

## Bertil Moberink:

Pîrsa kurdan, hê dî Komisyona Mirovayî ya Yekitiya Neteweyan de ne hatiye raberzandîne. Lê pîrsa kurdan tucar bî awaki xurt dî Yekitiya Neteweyan de ne hatiye zîman. Sedema vê jî, bî kêmasiya piştigirtiya navnetewî tî izah kirin. Lî angori Komisyonê, jî ber ku piştigirtiya navnetewî tune ye pîrsa kurdan piştigirtî dî Yekitiya Neteweyan de nabîne, divê nebe asteng lî pêşiya xebata ku Swêd çêke. Ger wulo be, prebsibeke weke viya tî vê manê, ku rêya alikariyê jî bo pêk anina gelemperî hatiye girtîne. Jî ber ku rewşa gelê kurd lî her perçeki ne hat zîman. Û ev rejimana nêzikê tu

qenc kirina rewşê nabîn, divê pîrsa kurda hem lî Yekitiya Neteweyan, hem jî dî rêxistinên din a navnetewî de bê zîman. Jî bo pîrsa kurda tu piştigirtî ne diye, biryareke lî dij mafê gelê kurd a Yekitiya Neteweyan zîrarek na de pîrsa kurdan. Her insiyatifeki jî bo gelê kurd alikariya pîrsa wan e.

Argumenta, ku Swêd ne endamê Komisyona Mirovayî ya Yekitiya Neteweyan e, ne dî cida ye. Ger Swêd tenê lî angori endamiyê kar pêk bîne, wê gavê imkanên welatên me gelek kê m dibe. Çawa ku Komisyon jî bî me re ye. ku gelê kurd hewcedarê alikariyê ye. insiyatifeki Swêdê bî feyde ye. '



# GALILEO GALILEI

## Û

# VATINIYÊN REWŞENBIRI

*Mirza Bextiyar*

Dı nava zanıstyarên beriya şoreşa sanayiyê de, li dinê yê ku ji ali piraniyê de jiyana wi baş tê zanin, bî a min Galilei ye Ev yek ji cudayiya afirandinên wi nayê. Ji ali mazinahiya afirandinên wi ji nayê. Ev yeka ji ber sedema jiyana wi ya rengin, têkili û dijitiyên wi yên bî hêzên serdest (ji kraliyetê bigre heta bî dêrê) re tê. Vê sedemê ji tenê bî serê xwe ew hewqasi neda naskirîne.

Niviskarê mezî Bertholt Brecht jiyana vi şexsiyeti kir sembola rewşa hîm zanıstiyar û rewşenbirên ku di bin nîrê zordestiyê de ne. Û ji jiyana vi şexsiyeti listikek(şano-Piyas) giranbuha pêkani. Vê listikê bala gel û bî taybeti ji bala hemû rewşenbirên dinê kışand. Ev listik li her derê dinê pîr caran hate listin, li hîm ciyan deh-panzde caran hate listin, li kuderê ev listika han hatibe listin, gelek niviskar, ronakbir, zanıstiyaran ditnên xwe li ser vê yekê nivisandinê, her wiha di ser hîm ditnên ku li ser vê mijarê, ketine raberizînê fireh û kûr. Sed caran biqasi stûrbûna pirtûka listikê, li ser listikê nivis hatne nivisandin û weşandin.

Dı Galilei'ya Bertholt Brecht de Galilei ji bo hemû yê cihanê û mirovatiyê dixebite. Û ew di dawiya vê xebata xwe ya bê lebat de di dîde kîşkirîne ku dînya digere. Heta wê demê dînya wek tepsiyekê û di cihê xwe de

sabit dihat zanin. Ev ditna Galilei, ji bo hemû sli û berran şoreşeke ji bo dêrê û ditnên kevnare ji di bîngê de dinamite. Ev berrê han rê nade ji vê ditna ku wan tehdit dike. Galilei digrin stuyê wi datin bî kêrê, jê dipîrsin. "dînya digere?" dibêje "na dînya nagere". Ji bo ruhê şêrin, baweriya xwe ya rastin inkar dike. Herçiqasî ji bo vê "itirafê" soza parastina afirandina (esera) wi didin ji, ev ji bo wi bînketnek giran e. Ev bînketna taqeta wi dixine, baweriya wi ya ji xwe dîşkine, xwezokiya wi ya tekoşinê dimirine.

Dı listika duduyan de (eyni listik sala 1948'an de cara duduyan tê nivisandin) Galilei disan di hoyên bî kêrê de ji ditna xwe dikeve, her weha bî vi rengi bîndikeve, lê baweriya wi naşikê, ji taqetnakeve, ji nû ve çokan (çogan) dijdine.

Ev yeka ku Brecht cara duduyan di dîde nivisandinê şerê diwemina dinê û nemazê bombeyên Nagazaki û Hiroşima yê ne.

Ev listika giranbîha gelek tiştê fêri mirovan dike, hîm bî rasti bî bira mirov tine. Ev yek bî a min ji netica listikê grîngtir e.

Ev listik di xwaze bêje:

- Çavên gerandîna dinê dibinin di hoyên bî kêrê de hîm jê di neqin.

- Hîm rewşenbir, di xebata pêşve xistina mirovi de, şûna bî kevnepereştiyê re şer bikin, bî wan re lihevîten, hevkarîyê dîkin.

- Ji bo mirov bigihê armanca xwe, di hoyên ku hêzên serdest xurtbîn û mirov çels be, gengaziya şerê aşîkar tune be divê mirov ji rovi fêlbaztir be.

- Bî navê taktik an ji kurnaztiyê divê mirov ji armancê gewre dîr nekeve. Kurnazti û taktik pêwîst e, lê ji bîzdok û şerrevare ne be star.

- Bînketn û baweri windakirin tiştê ji hev cihê ne. Evê yekmin şikestina şaxên darê ye, evê duemin hîşk bûna rehên darê ye.

- Dı hoyên ku zanisti li diji-mirovî tê bikarinin, berpirsiyariya zanıstiyaran, rewşenbiran hîm girantir dibê.

- Bî kurtayi, piştî temaşe kirina vê listikê hoyên gengaz, kû mirov li xwe û karûbarên buhurî bî nêre çî bî heye. Û divê evên ku bi çavê zanıstiyar, rewşenbir tê nîherin, nemaze evên li welatê di bîn diktatoriya dane bî pişt xwe vegeyin prêzê xwe di çavde derbaskin.

Ev listika han berê du cara li şanoyên Tirkîyê listibû. Van rojê hanê em têdene li Tirkîyê cara sîsêyan di ber pîrsiyariya Genco Erkal "Dostlar tiyatrosu" û di bî gerandîna Rutkay Aziz'da "Ankara sanatçılar tiyatrosu" dileyize. Ji ber vê yekê gelek niviskar, rewşenbirên tirk kovarê çandi, pişeyi û di nav rûpelên rojnameyan de li serê agahdari û ditnê xwe lê dîkin. Çî mîxabe ev tev ditnê gelemperi û soytin. Ne yek ji van rewşenbira,

weşanên fermi da, di ronahiya berpirsiyariya rewşenbiri li pirêzên xwe nefetiliye, karûbarên xwe û berpirsiyariyên pêwist ne meyizandiye. Ev tenê serê xwe rûçikê rewşenbirê fermi yê nî bî diplomê nişan nade? Ev di hoyên bî vi 'suci' mirov nayên darvekirin de, tê jiyandin. Ev rewşenbirê han, kû bî tujayi Galilei bî bê berpirsiyari itham dikin, sed hezar car ne bê berpirsîrîr?

Di her civati da rewşenbir, zanistiyar, bî tev çerxa gerandinê, serfirazi û gelşê wê zanin. Ew bî xwe di dewra vê çerxê de ciyek gring dîgrin. Riya pêşvexistin, vekirina girêgêlşa, teşhiskirina nexweşinên civaki, tev ji rewşenbira vê tê ditin. Pêşvexistina teknoloji de rolek himi dileyîzin. Jî ber van yekan li gîşt civatan de berpirsiyariya rewşenbir, zanistiyar nayê guhartin. Mirov kare bî hêsani bêje, evên di vi kari de dereca yekemîn berpirsiyarin, ev in. Lewra, evên sedemê taritiyê û riya gîhandina ronahiye zanin, ew in. Tu car mirov nikare berpirsiyariya gundiki û rewşenbireki muqayese bike. Zanina gundiki, bî kar û barê gunditiyê tixûbe. Beri her tiştî dinya wi ewe Lê evê zanistiyar, rewşenbir?

Roja iroyin bê hed û hesav gelşê Tirkîyê û Kurdistanê hene. Xwediyê gelşên gir, gelê kurd û çina karker û gundiye. Azlû kirina va gelşa, rê nişandayina derman kirina van birina de berpirsiyariya giring li ser milê zanistiyar û rewşenbira de ye. Lê, vanê han heta kûr û çiqas vê vatîniya xwe tinin cih? Mirov nikare bersivê ji bo gîştî bî gelemperi bide. Rewşa gîştî ne wek hev e, cûr bî cûr e. Hinek jî van xwedî sermiyan û mulkin, an jî xulamtiya wan dane. Vana bî navê berpirsiyariya civaki, berpirsiyariya çina xwe tinin cih. Gelşa vana bî pêşvexistina civakê, mirovatiyê tune. Bî her awa-

yên xwe bî serdestên civakêra hevkarin. Hinek jî wan jî, bî her tiştî, xwe dane pêşvexistina mirovayi, civaki. Di hoyên gelek xerab de bî her kul û kêmasi, di serê cih anina berpirsiyariyê xwe de ne. Di her êrişên serdest li bîndesta, hedefa yekemîn ev kes in. Jî ber vê yekê bî seditiro, zanistiyar, rewşenbir di girtihgeha an jî koşeki biyanistanê ne. Qismên mayin jî, bî dev berpirsiyarê herimezinin. Lê kar de ne hevalê devê xwe ne. Evê binê simbêla de bî tmazi zêdetir bî Galilei dîkenin evin. Ev kesên han di rojên firh de bê tirs gallegala dikin, di rojên teng de bî navê 'taktik' û 'kurnaztiyê' xwe dîxilmisînin an jî deng jî wan derêji kes jî wan fahm nake çî dîbêjin.

Ev dirokzanistiyar, zargotinzanistiyar, civakzanistiyar li ser Tirkîyê êdi çî bêje tiştêki vekolinê nehêştine. Li ser stranek gelêri, li ser diravek diroki, li ser xwarnek, li ser her urf adetek piçûk, pirtûkan tije kirine. Lê li ser sansûrê, li ser her bendê pêşiya wane bî fikare, bî tirs ya nivisandine ya jî qet 'hewce' neditine binivisîn. Li ser gelşên gel qasi tixûb hatiye danin qal dikin. Tîm bala wan li piyê wane jî bo tixûbê derbas nebe.

Ev kesê han, çawa Galilei bî gerana dinê agahdar be, jî gelê kurd xweş agahdarin. Gelek xweş zanin neteweke, diroka wan, erdên wan heye, xwedî zîman, urf-adet, çandek arizî ne. Ev gel çewa birindarek xwin wînda kiribe hewce: xwinê be wisa hewcê alikariyê ye. Hewcê dirokzanistiyar, zîmanzanistiyar, zargotinzanistiyar û hwd. Ev zanistiyar, Rewşenbirê "berpirsiyar" berde li ser diroka gelê kurd, çanda wi, li ser stranek wi ranebeziye. Dema çavê wan li dar ketiye navê gelê kurd nanine li ser zîmanê xwe. Îro dinya tev bî hebûna gele kurd zane û qebul dike. Hun jî bê şik pê dizanin, nevêjin,

ev gel pêwiste bighije mafê xwe jî xwe bî rengê xwe yê nuha hun nabêjin em jî ne lêviya vi tevgera wene, lê hebûna ev gelşên gelê kurd têdaye, jî vekolina stranek gelêri ên Tirkîyê biçûktir nine. Dema hun sîrf jî talûka bo çend sal girti nemînin di dawiya sed sala xx. hebûna vê rastiyê qebûl nekî; sed hezar car jî Galilei yê sed sala xvi. (ew jî mijarê jî bo raberzîne) bê berpirsiyartîrîn. Weki di vê sed salê de, jî tîrsa bêjin "Dinya nagerê" qet ferq di navê de tune. Mafê vana ku qala berpirsiyariya zanistiyari, rewşenbiri bîkin, tune. Jî bo vê bîzdokîya xwe, nikarin taktik an pêwîstbûna "kurnaz" tiyê, nişan bîdin.

Ev jî berpirsiyarbûnê dîr ketin ne tenê jî bo doza gelê kurd, jî bo gelê tirk jî wisa ye.

Roja Îroyin, li Tirkîyê karbidestên faşist li ser dar in li welat her tadeyi, zordesti peydaye. Piçâ mafê mirovi û mafê demokratî tune. Di van hoyên xerab de jî deng jî rewşenbir û zanistiyarên fermi nayên. Car carna deng bê jî, jî nûze derbas nabe. Di serê diji faşizme de "taktiki" bê jî berê namluya jî faşizmê nayê guherandin. Dînya heta nuha jî faşizme zordestîr, xirabtir nîzam neditiye. Şerê diji faşizmê vatnî ki mirovperweriye. Rewşenbir û zanistiyarên fermi şûna bî faşizmê re şerbîkin, dîçin 'aql' dîdî, nesihetan dikin. Qaşo ev "aqlmendên" me bî vi awayî dîxwazîn faşizmê dîr bîxin(!).

Jî zanistiyar û rewşenbira kesê vatîniyê nî xwe neyîne cih, jî baweriya xwe re dij bikeve, heta bîjin hene. An jî, piştî bîmîrî gel qala wan bike jî, bê şik ewê bî nayîni be. Lê evên vatîniyên xwe binî cih, tû car namîrî; her û her ewê di dilê gel de bîjin. Di rûpekên dirokê ê bî zêrin û di lêvên gel de bî gramgîrî, xwezokî bir bî nî. Îsmail Beşikçi jî nuha ve minakeki ye.

# Dîmên Zuman

Zuman rûdayek cıvaki ye. Demek dūr û dirêj de, ta ji peydabûn û bî hevra jiyina insana ve pêk hatiye û li gor rewş û pêş de çûna komelê heyîya xwe parastîye û her çû dewlemend bûye û dibe. Ew ji pêvistiye n cîmaetê û jiyina hevbeşî peyda bûye, mirova bir û baweriyên xwe, dilxweşî û nerehetiyên xwe, evin û heziyên xwe, xebatê xwe yê berhemkari û ceribên şuhlê, bî kurteberî gîş xastek û mebestên xwe bî arîkariya zimên ve gotine.

Diroka mirovayî û zimên xetek navhevi nişan dide, mirov nîkare ji hev bike û cîda cîda bigre berçav. Ew taybetiyek cıvaki û insani ye, li rûyê dinê tu kes, tu netewe û kêmeneteweyek nîne ku bê zuman û bê çand e.

Zuman, berçav gertî û danezanîna netewe de mercek bîngihin e, bê vîna kes nîkare cîmaetek wek "mîlet" bî nav ke. Jî ber ku dî diroka mirovayî de, ki ku netewe ye, an jî kêmayetiyek netewî ye divê xwedî zuman û ferhengêk taybetî be.

Li ser peydabûn û pêş de çûna zimên gelek teoriyên navdar pêkanîne, pîrsên zuman bî teherêk zanistî hatine şîrove kirin û vekolinên baş û tîkûztir hatine weşandin. Vê nîvisarê de mebesta min ew nîne ku li ser te-

---

*Mecit Dersimi*

---



oriyên zimên rawestim û taybetiyên ziman û zimana yek bi yek deynim berçava. Dîxwazim ku vê nîvisarê de li sedem û dawiyên qedexe kirina zimên binhêrim, kolonyalist û zordar bo çî ji ziman û çanda neteweyê bîndest dîtîrsin, armanc û daxwazên wan çine û hwd... li ser van pîrsiyara mî jûl bîm.

Dewletêk kolonyalist û zordar ku welatek zeft dikir pêş her tiştek dîxwast heyyên wi yê sererd û bînerd bî dest xe û dewlemendiya wi bî zori ji xwe re mal ke: siyaseta şêlandinê pêşberî berxwedana gelê kolonyê nemine û bo kolonyalista nerehetiyên mezî çê nebî. Bona vê yekê siyasetek taybetî peyda kirin, bî vi awayî sedî sal ked xwari û zilmeke bê wene domandin.

Gelên kolonî hîmber siyaseta kolonyaliyê bê deng neman, tîm û tîm birhelîstî kirin û serhîldanên xwunî çê bûn. Pîr car berxwedana xelkê kolonyê û bîndest xwunê dî hate gevîzin, bî hezaran mîrxas dî rêya azadî û rîzgariya welet de hate kuştin. Lê tele fatê dijîmî ji kê mî nebû, disa jî sedî sal dest jî siyaseta kolonyaliyê neşîkandî, heya

ku rewş û mercên gelên kolonyê û yê dînyayê gîhurî, neteweyên bîndest hîşyar û bî hêz bûn û sistema kolonyaliyê hate parçe kirin. Nîha dîroka kolonyaliyê wek berê û wek sistemêk nemaye. Lê belê hîm li ser rûyê dîne hînek welatên kolonî û gelên bîndest hene û bî zîlm û şêlankerîya emperyalî û kolonyalî ve rûberû ne. Kurdistan û neteweyê kurd yekê jî wan e. Ne tenê zîman û çanda wî, nav nîşanên wî û wek peyvek "Kurdistan" jî qedexe kirine.

Van dewletên ku Kurdistan kolonî kirine, li gel siyaseta kuştin û kuştariyê nebûna neteweyê kurd û welatê Kurdistan jî propaxandê kirin. Hîneka dîgotî. "Kurd Samî ne û mîsîlman in' Îran dîgot' Îranî ne û farsên çiyayî ne', Dewleta Tîrk jî "jî xwe jî berê ve de ne Kurd hebûn ne jî welatek bî navê Kurdistan. Ewkesên ku jê re dîbêjin kurd, ew Tîrkên ser çiyê ne, kurdi jî tîrkîya çiyê ye". Dîyare ku bî van vîr û derewan ve dînya nayê lê bandî û nîkarmî her û her gelê bîndest bîxapînin. Lê dîvê mîrov ya rast bêje, bî vê siyaseta derewî ne tenê hînek bîyanî, qîsmêk kurd jî hatî xapandî jî neteweyê xwe û zî-

man û çanda xwe bî dîr ketî.

Bo çî dewletên kolonyalî, neteweyên serkar zîman û çanda gelên bîndest û zorlêkî qedexe dikî; hewl dîdî ku neteweyek jî bîni de rakî û dî nav neteweyê serkar de wînda bîkî û bîhelînin? Ev siyaseta li ser çî bîngê û nexşeyek hatîye damezrandî û çawa kêrî wan tê? Lê belê ev çend zîlm û sordarî kirîne hezar û yek dekdolav gerandî bo çî negîştîne mîrazî xwe û bî serneketîne?

### ZIMAN Û REWŞA BAZAR:

Wek tê zanî pêkanîna bazarek netewî bo çîna sermîyandar pîrsek bîngê. Jî her tîştî pêş de dîxwazî ku bazarek welat dî bîndest û fermana wan de be, heya û dewlemendiya welat li gor qezenc û daxwazên xwe rêkûpek bîkî. Bazarek de gîş malên bazîrganî bî rehetî û fîrewan belavbî, rewş û mercên dan û standîne xweştir be, hêza kar û hêzên berhemdar li gor kêf û pêvîstiyên çîna sermîyandar cîbecî bî.

Carna bazar jî yek neteweyê jî yek zîman pêk naye, çend zîmanên cîda cîda tîne peyîvî û dewletek pîrneteweyê tê berçav. Ev rewş li gor dînyabîni û qezencî burcuvazî tiştek ne destdar e, mercên li kedxwari û şêlandîne gîran dîbî û nereheyî-

yê mezî tîne pêş. Bona vê yekê li gel zebr û zorê leşkerî siyasetek cîvakî, çandî û perwerdeyî jî pêya dikî. Zîman û çanda gelê bîndest qedexe dikî, şovenî û nîjadpareziyê li ser detînin. Bî vi teherî rebazek kevneperest û bê rehm dîgîrî pêş û dîxwazî ku jî alîya zîman û çand ve cîdatiyê jî nav rakî, û pêşîya dan û standî emtîye ve-



kın û rewş û çenzenca wan dî rê-  
yek bê asteng de bimeşe.

### ZIMAN Û NETEWE:

Wek pêş de hatiye gotin ziman,  
bo cîmaetek mîna netewe, xîslet  
û taybetiyek kûr e, bo hebûn û  
jiyindomiya wi pêwîstiyek diro-  
ki pêk tine. Mîrov bî arîkariya  
zîmên ve difikîrîn, raman û dax-  
wazên xwe bî vê rê ve dibêjin,  
efranerî û gîş xebatê xwe yê n  
berhemdar û kêrhatî bî arîkari-  
ya wi ve dîxî n berçava. Disa ev  
e ku mîrova yek bî yek bî nete-  
we an kêmenetewek ve grê dî-  
de û dîke nunerek cîvaki.

Kolonyal û neteweyê n serkar jî  
her kesek baştir dîzanî n ku bî  
rêya zordarî û kedxwarî ve heya  
axîriye mîletek nîkarî n bî rehetî  
bîndest de bîhêlî n û talan kî n.  
Lê disa jî dest jî nav rakîrî n ge-  
lê bîndest nakîşî n, hewl dîdî n  
ku emrê şêlandî nê û zêrandî nê  
her çû dîrêj kî n. Bona vê lî gel  
tevdîrê n dî n seba jî bîrkîrî n zî-  
mên jî zagon û fermana pêya dî-

kî n, vî wari de teorîyê n bê çî ne  
û bê esas peyda dîkî n. Û lî ser  
nebûna zîman û çanda gelê bî n-  
dest cure cure propaxandeyê n  
derewî n belav dîkî n. Mebesta  
wan ewe, ku xwebûn û hestê n  
netewî jar kî n, bîr û bawerî ya  
gelê bîndest bî xwe nemî ne, û  
hêdî hêdî jî hêz û berxwedanê  
bîkeve. Jî ber ku çandek bî gîştî  
hebûna zîmanek ve grêdayî ye û

neteweyek bê zîman nabe. Dî  
derheqa nebûna netewe yê bî n-  
dest her çû lawaz dîbe û paşero-  
jê de dîbe jî nav jî rabe. Wek tê  
dîtin rola zîmanê netewî dî wa-  
rê hebûn û ziyana gel de cîhek  
gîring û pêwîst dîstî ne.

Bî wê ne, şêst sal bê tî re, ku Ko-  
mara Tîrkîyê navê Kurdistan û

Kurd bî resmî qedexê kîriye, rê  
nedaye û nade ku zîmanê kurdî  
û çanda kurd bî serbest û azad  
bîjî û ber bî pêş bîçe. Lî ser di-  
rok, zîman û çanda gelê Kurdis-  
tan , teorîyê n bê bîngê h û bê  
çî ne peyda kîrî ne û bî her cure  
îmkanatê n dewletî ve propaxan-  
deyek bê hempa dîweşî ne. Îran  
Îraq û Sûrî jî bî tevayî dî vê rê  
de dîmeşî n û jî gelê Kurdistan  
re tu mafê n netewî, demokratî  
û mîrovîyê nenasî ne. Dîyare ku  
bî vî sîyasetî ve dîxwazî n ku ge-  
lê me jî nav bîbî n, hestê xwebû-  
na netewî roj bî roj lawaz bîkî n  
û çene azadbûna gelê bîndest bo  
demek dîr û dîrêj paş de bavê-  
jî n.

### SERGÊJÎ Û HESTÊ NIZMÎYÊ

Dewletê n kolonyal ê n Ewrû-  
pa dîgotî n: Em dî her wari de  
gelek pêş de çûne, mîletê n ba-  
jarvan î n. Tu hewcedarîyek me  
bî Asîyê, Efriqê û Emerîka yê  
Latî nî nî ne. Lê em bî navê mî-  
rovi hatî ne vî r û dîxwazî n ku we  
jî vê hovî tî û kovî tîyê xîlaskî n û  
jî we re rewşek xweş pêk bî nî n.  
Bî vî teherî xwe wek xelaskarek  
dîlsoz nîşan dan, mebestê n xwe  
ê n aborî û sîyasî perde dîkî rî n.  
Bî zîmanê dewleta kolonyal ve  
fêrge û zanînge vekî rî n. Gelê n  
kolonî hî nî zîmanê wan bû n û  
bî adet û exlaxê wan ve hatî n  
perwerde kî rî n.

Dîyare ku çî Ewrûpî, çî Asî be  
armanca kolonîyala her yek e:  
Ked û dewlemendîyê n welatek  
kolonî bîşêlî nî n. Lê, lî gor rewş  
û pêşdeçûna dewleta kolonîya-  
lê teherê n şêlandî nê û talankî-  
rî nê piçek cîdayî nîşan dîdî n.  
Bî wene Komara Tîrkîyê, vî wari  
de jî hemûyan bê tî r zîlmkar û  
nîjadparêz e. Tu heqek însanî û  
çandî nenasî ye û dîxwaze ku  
mîletek bîhelî ne û dî nav nete-  
weyê Tîrk de wînda bîke. Ko-  
lonyalî ya bî van kî rî n û propa-

xendeyê n bê çî ne û derewî n ve  
dîxwestî n ku dî demek de xelkê  
kolonîye sergêj kî n û bîxî n nav  
hestê nîzamîyê. Wan jî nîrx û a-  
detê n xwe yê n cîvaki û tarîxî bî  
dîr bîxî n, Bîr û bawerîyê n wan  
ê n netewî hêdî hêdî sîst bîkî n û  
wan bîkîşî nî n nav neteweyê ser-  
kar. Jî ber ku ev rêbaza emrê  
kedxwarî û talanê dîrêj dîke,  
hestê seri rakî rî n û berxwedanê  
lavaz dîke, rewş û mercê n şelan-  
dî nê hêsan tî r dî bî n.

Ev sîyaseta şexsîyê tî kubarî ya  
mîrovê n kolonîye jî paş ve dîxe  
bo peydabûna çaş û xulamoka  
zemin fîreh dîke û mercê n dest-  
dar pêk tine. Wek tê zanî n, jî  
nav gelê n kolonîya pî r kesa ta-  
yê neteweyê xwe negîrtî ye, çê-  
kê zîlmkara hîldanê û dîrêjî ge-  
lê xwe kî rî ne. Ev kesê n usa ne  
tenê dî nav mîrovê n sade û sawî  
de, dî nav ronakbîrê n kolonîyê  
de jî berçav dîkevî n. Helbet se-  
demê n çastî û xulamtîyê n ne  
yekî n, hînek sedem û bûyerê n  
dî n jî wî wari de rolek bîngê hî n  
dîleyî zî n. Lê sîyaseta kolonîya-  
lîyê jî peydabûna mîrovê n usa  
hêsan dîke wek mebestek bîngê-  
hî n datî ne pêşî ya xwe.

### PAŞ DE XISTINA HIŞ Û HIŞYARÎYA MİROV

Pî tîkek tê dî nê, çavê n xwe hum-  
bêza dîya xwe de vedîke. Bî ger-  
mî û evîna dê ve mezî n dîbe. Za-  
rokî ya xwe dî malbatek de, û  
ser bî cîmaetek ve derbas dîke.  
Hî nî zîmanê zîkmakî dîbe, lî gor  
çand û adetê n rêzgîrtî nê n cîva-  
kî terbîye dîbe, xû û xîsletê wê  
yê n cîvaki bî bî awayî pêk tê n.  
Bî kurtebîrî, dînya zarok lî gor  
zîman û çanda malbata wî û cî-  
maetê wî çê bûye û hîşyarî ya  
cîvaki û pleyê zanîyarî ya wî bî  
rewşa komel neteweyê wî ve gî-  
rêdayî ye. Zarok ku bû n şêş-heft  
salî n dîçî n fêrgehê,  
roja yekem bî fermanek ecê b  
rûberû dî bî n: ' Dîvê hun jî



vır şun de çı nav fêrge, çı derve bı zımanek dın wê nepeyivın. Ki ku lı gor vê fermanê nemeşi ya divê ji me re bêjin ku em ce-zayê bıdın. ' Bı wê ne lı Tırkiye zarokê kurda dı destpêkê de bı fermanek evto ve rûberû dıbin. Bı vi rebazı zaro dıkevın dũ hev, nerehetiya hev dıkin û ji mamoste re ji sixuri û casustiyê dıkin. Jı aliyê dın ve ji xwendekarê biçûk şaş-mat dimine û dinya bı ser de tê. Jı ber ku mamoste zımanê wi yê zıkmaki qedexe kırıyeû dıxwaze zımanek bıyani bı zori bıde hinkırın. Bı cûrek dın, dinya ku zarok bı zımanê xwe yê zıkmaki ve çê kırıye bı-ruxine û bı zımanek bıyani ji nû ve xwe re dınyak dın çê bıke.

Diyare ku ev rêbaza lı ser hış û jiyına zarok ên kurd de karek nebaş dıke, astengek mezın datine pêşiya zarok. Lı gor zanıtên pedagogi û ruhiyatê ev rebaza nahêle hışyariya xwendekar pêş de bıçe. Bona vê yekê demek dũr û durêj ji seregêji û tengbiniyê xilas nabın. Ev rewşa ruh û sehkirina wan xırab dıke. Dawiderek dın ji ev e ku, zarok ji rêz û rûmeta zımanê xwe yê zıkmaki dıkeve şikê. Gelo ev çı zımane hini mın kırne? Bo çı mirovek wek mamoste zana û birêz qedra zımanê me nake? Dêma zımanê ku ê me dıpeyivın ne zıman e, û tışteq tevatur e... 'Ev prisıyarê n han tên birê û bersivên zaroka ji pırcar rast nabın. Helbet mirov nikare cırmê vê siyasetê bavêje ser milên mamoste û mamostan. Ev, ê dewleta kolonyaliyê ye û wek tê ditın mamoste yê n demokrat û pêşverû ji pêş-beri vê ne.

Mırov dıkare bêje: ev siyaset, xwendevare n biçuk ji malbat û cıran ji qom û neteweyê xwe dılsar dıke, pırcar ji wan biçûk dıbine û bı vi awayi dıkeve hestê nızmiyê. Ev rewş û dezge, mirov hê di hê di ji komel û nete-

weyê xwe dũr dıxe, pêwendiyên wi sist dıbin û carna vedıçetın.

Ev bûyera ne tenê dema zarokti de, bı tevayi jiyına mirov de û demek dũr û durêj xwe diyar dıke û pêk hatına şexsiyeta mirov de karek xırab pêk tine. Divê û pêwıste ku mirovên kolonyê an ji yê neteweyê bındest ev xû-xıslêfên ku zordara dı wan de peyda kırne ji wan xwe xilas bıkin û pêşiya xwe û gelê xwe vekın.

Wek tê ditın gelek xwendevanên kurd xwe kurd nabının û ji gelê xwe dũr dırevın, û heta xwe lı ser neteweyê serkar dıhesibının. Xwe wek Tırk, Ereb, an Fars dıdın nasın û bı vê tewre nerast ve xwe dıxapının Jı xwe daxwaza dıjının ji ew e ku xwe-bûna xwe wında bıkeû xwe bıkişine nav neteweyê serkar. Gotına mın ev nine ku em nijad û rezê xwe ji ên dın baştır û bılınd ragırın û bıkevın şopa şovini û neteweperestiyê (nasyonalisti). Ev tewra xasıma bo gelê bındest ne baş e. Jı ber ku gelên bındest bo azadi û demokratiyê şer dıkin. Ê dıxwazın ku her cure kevneperesti, nijadparêzi û şoviniyê ji nav rakın.

Hinek kes zımanê xwe yê zıkmaki wek zımanek serbıxwe nabının û nırx pê nadın, xwendın û nıvisandın bı wi wek karek bê kêr û bê xud bı nav dıkin. Diyare ku ev ji dawiderek siyasetê kolonyali ye û ji hestê nızmiyê tê pêş û kêri gelê bındest naye.

Hinek ji xwedi bir û baweriyên siyasine dıjbêri siyasetê kolonyali ne û bo rızgarkırına gelê bındest şer û xebatê dıkin. Lê lı ser zıman û çanda gelê xwe seri naêşının, pê mujul nabın. Carna xebatê zıman û ferhengê wek kırnek duwemin dızanın, pêk hatına hest û hışyari ya netewi de rola zıman û çande mına pêwıstiyek bıngehın seh na-

kın. Ev ji kêmasiyeke gışti û girring e û divê ji nav bê rakırın.

Wek tê zanin siyasetê kolonyali dı her warê jiyına gelê bındest de xwe nişan dıde. Pırsên zıman û çand ji ne bı ser xwe ne, bı pırsên dın ên komelê ve grêdayine û ev bûyerek diyaletiki ye.

Siyasetê kolonyêliyê dı ser nexşeyek kûr û fireh de hatiye bınav kırın. Lı vır tıştên ku hatine gotinê xasıma derheqa zıman û çand de ne nû beşek ji siyasetê kolonyali ne. Armanca zordar û koloni parêza bı çı rê û rêbazek ve dıbe bıla bıbe, jı nav rakırın, an ji bo demek dũr û durêj bındest de hıştına gelê kolonyê ye. Bı curek dın temenê kedxweri û şêlankeriyê çıqas ku durêj bıkin ewçend kêri wan tê. Bona vê ji çı ku ji dest hat çet dirêxi nakın.

Lê diroka mirovayiyê ber bı paş nameşe û tım û tım ber bı pêş dıçe. Rewş û mercên dınê yek bı yek ên hemû gel û welata lı gor zagonên civaki û xorist (tebi) tên guhastın û komela miroviyê her pêş de dimeşe. Hêzên berhemê her geşn dıbin, terkebê çınayeti dıguhure, lı gor taybetiyên sedeyê, çın û tebaqeyên şoreşger bo guhastın û pêş de bırina miroviyê rêz dıbin û seba dınyak azad û serbılınd dıxebıtın. Gelên bındest û koloni ne tenê ne xwedi dost û pıştivanın, xwe sedem bı vê, sistema kolonyaliyê hate pıjkandın û pıraniya gelên bındest rızgar bın û dewletên serbıxwe hatın damezrandın.

Dıjınên gela çıqas bı hêz dıbin bıla bıbin, çıqas zanaye fend û fola bı nıkarın ta dawiyê pêşiya neteweyê me bıgırın. Em ê welatê xwe, zıman û çanda xwe azad kın.

# KURDISTAN SPOR DI LİGA ŞEŞAN DE



Isal Kurdistan spor li Stockholmê di dereca 6 an de dilize. Par Kurdistan spor, bi taximeke gelek baş di dereca 7an de dest bi futbolê kir û di dereca xwe de bû şampiyon. Bê şik ev serketin ji bo destpêke gelek baş bû. Li Angori berpîrsiyarê Kurdistan spor Ahmet Baksi û kaptan Sîdar, " isal şansê şampiyoni kêm

e. Lê emê disa çî ji me bê dê pêk binin.

Divê bi kerema xwe kurd werin maçên me temaşê bikin û piştgiriye mişan din".

Em li jêrê şema yê maçên dereca 6 an diwêşin.

## Beşa A

OMGANG	SERIE	PLAN NR	ZON	VECKA	DAG	MÂN	KL.	PLAN	HEM.LAG	BORTA LAG	RES.	
1	H7B	55	22		MA	23	4	14.15	VÄDDESTA2	IFK VIKSJÖ	KURDISKA	-
2	H7B	25	18	17	ON	25	4	18.00	SPRNGAIP2	KURDISKA	JÄRVA SK	-
3	H7B	10	22	18	LÖ	5	5	13.00	BOLIND 1	HK 79	KURDISKA	-
4	H7B	25	18	19	ON	9	5	18.30	SPRNGAIP2	KURDISKA	VASAPOJKAR	-
5	H7B	50	22	20	LÖ	19	5	13.00	VÄDDESTAV	SÖDERH/WASA	KURDISKA	-
6	H7B	25	18	21	ON	23	5	19.00	SPRNGAIP2	KURDISKA	KASPIEN IF	-
7	H7B	25	18	22	ON	30	5	19.00	SPRNGAIP2	KURDISKA	SUMPAN FK	-
8	H7B	10	22	24	MA	11	6	10.45	BOLIND 1	JAKOBSB FF	KURDISKA	-
9	H7B	25	18	24	ON	13	6	18.00	SPRNGAIP2	KURDISKA	JAKOBSB GOI	-
10	H7B	50	22	31	FR	3	8	19.00	VÄDDESTAV	JAKOBSB GOI	KURDISKA	-
11	H7B	25	18	32	ON	8	8	18.30	SPRNGAIP2	KURDISKA	JAKOBSB FF	-
12	H7B	20	21	33	LÖ	18	8	13.00	SUNDBYB 2	SUMPAN FK	KURDISKA	-
13	H7B	80	18	34	ON	22	8	20.00	KISTA IP2	KASPIEN IF	KURDISKA	-
14	H7B	25	18	35	ON	29	8	18.00	SPRNGAIP2	KURDISKA	SÖDERH/WASA	-
15	H7B	30	1	36	TO	6	9	18.15	STADSH 1	VASAPOJKAR	KURDISKA	-
16	H7B	25	18	37	LÖ	15	9	13.00	SPRNGAIP2	KURDISKA	HK 79	-
17	H7B	60	18	39	LÖ	29	9	13.00	HUSBY PLA	JÄRVA SK	KURDISKA	-
18	H7B	25	18	40	LÖ	6	10	13.00	SPRNGAIP2	KURDISKA	IFK VIKSJÖ	-

## Beşa B


OMGANG	SERIE	PLAN NR	ZON	VECKA	DAG	MÂN	KL.	PLAN	HEM.LAG	BORTA LAG	RES.	
1	R5D	65	19			28	4	11.00	SVANÄNGEN	SKÅ IK	KURDISKA	-
2	R5D	45	18	18	FR	4	5	20.00	HJULSTABP	KURDISKA	SÖDERH/WASA	-
3	R5D	50	19	19	SÖ	13	5	10.45	SÖDERBY	MUNSÖ IF	KURDISKA	-
4	R5D	45	18	20	FR	18	5	20.00	HJULSTABP	KURDISKA	LILLSJÖ IF	-
5	R5D	20	16	21	SÖ	27	5	10.45	ÅNGBY IP2	FK BROMMA	KURDISKA	-
6	R5D	45	18	22	TO	31	5	9.00	HJULSTABP	KURDISKA	PLAVI TEAM	-
7	R5D	40	20	24	SÖ	17	6	12.30	RÅSTASJÖN	IFK SOLNA	KURDISKA	-
8	R5D	45	18	33	SÖ	19	8	10.45	HJULSTABP	KURDISKA	IFK SOLNA	-
9	R5D	40	20	34	SÖ	26	8	12.30	RÅSTASJÖN	PLAVI TEAM	KURDISKA	-
10	R5D	45	18	35	FR	31	8	20.00	HJULSTABP	KURDISKA	FK BROMMA	-
11	R5D	20	16	36	FR	7	9	20.00	ÅNGBY IP2	LILLSJÖ IF	KURDISKA	-
12	R5D	45	18	37	TO	13	9	20.00	HJULSTABP	KURDISKA	MUNSÖ IF	-
13	R5D	45	22	39	SÖ	30	9	12.30	TALLBOHOV	SÖDEKH/WASA	KURDISKA	-
14	R5D	45	18			5	10	18.15	HJULSTABP	KURDISKA	SKÅ IK	-



# JİNDARİYA

# ROJAN

*Cigerawin*



Perçên kurd cıvaki û xudbini ya kurd tişteki eşkereye û nayê veşartin herkes dızani ko kurd du perçene:

1 Koçer.

2-Gundi.

ko herdû ji tevli hev dijin û kurdên koçer, pirên wan li rajorê Cızirê navbera herdû çeman rûniştine dijin ko dinavbera wan û xecerên Rûsya de wekheviyek mezın heye ko weke hev dijin, lê gelek ji van eşirên koçer bûne niv koçer û di zıvistanande di newalan de dıkevın hin xaniyên ko ji kelpiçan hatine avakirin û di biharan de derdıkevın ser pezên xwe û diçêrinin Ew, haviyan dıkevın konan ko li hında ma Suleymaniyê, ji wan re dibêjin: Hawar.

Ermenên ko li hêla Mûşê dijin dilê mirov bıwan dışewiti, her dem dırs û sawiran de dijin, xesma di wan cihên ko nêziki ko nê n koçerên kurdin.

Lê di iro de bırıka wê çaxê ye, çawa ko liç ew mirovê ko di rewşê û pişgala Ermena de navdare dibêji:

Kurdê koçer hin gund ji xwe re li ser zencira çiyayê Ermen ava kirine û ji vır tê zanin ko jimareke mezın ji kurdan di van hin daman de hebû. Heta di Mûşê de ko ji cihên bingehine ji wela tê Ermen, kurdên van hında man rewşê û pişgala xwe yê te vayi, kurdi yê dır wergirtine weke Eşira CAF, ko di hında ma

Şehrezûr de diji û di tevgerên koçeran de hin tiştên kes nedi hene ko biroj bar dikin û bi şev radizîn û barê xwe li serê çaya datê nin.

Hin eşirên kurd hene ko bûne dijminê mîliyeta xwe û eger ev gotin dîrist bi ko ev reng eşirên kurd dikevin nav dijmin yan ji dikevin sinorê dijminan

Kurd bi rewş û pergala xwe ya civaki ve bûne du perçe:

1- Şervan ko serkar, axa û xwedi qadên mezin û kurtêl-xwerên wa ji dinav de

2-Cotar, gundine, ko nivkole ne lê bi awaki xweştir lê grêbenda di navbera wan de xesma di navbera wan û axa de. kurdên eşir û gundi, xwe gelek payedar dibinin û bi axayên xwe di pesinînin xwe di pesinînin ko axa weke xwe û yeki ji xwe dibênin. Li gelek ciyan axa weke mirovêki şervan êrişker nasdikin û dibin saya serê wi de dijin, ko ne ji wi bi xelkê malê wan bixwin ev reng cotar filene

Lê gundi herweki ji mîleteki di ne. wilo li wan dînerin, brasti payedari serfirazi, rûmetmendi, di rîwên axa ve tenê xuyakirin, ko mirov dikari wan ji gundiyan nas biki û ji bo ko em karibin vê awirê rast û dîrist bikin, dibêjin: ko eşira Şikaka di karibûn wan eşirên kevnare ko diketin hindamên: Kotar.Soma wînda bîkîn û bi awaki tevayî kurd hemî ne weke hevîn, ko gelek dijware mirov baweriya xwe bîdi ser reng,rûçikên Entropoloci.

Ji ber ko dinav kurdan de rîwên giloverên ermeni û samiyên erebi û bêtir Nestoriyên mesîhi tene ditin, lê kurdan di hindama Suleymaniyê de reng û rûşikên xweyên irani, bîlind parastine. Ji ber ko dûri mîletên mayin mane.

Nivîsyanê ermeni Abovyan bîvi

rengî pesnê kurdan daye ko dibêje: dîriste mirov bicara pêşîn re ji mêraniya kurd ji kîncên wi. ji rûçikê wi yê bi tîrs û saw wi nasbiki ko ji mîrînê natîrsi.

Çavên kurdan fireh bîroni agiri ne bîrhên wan sîtûr, enî bîlind pozçilaki, weke pozê beranaye gavên xwe bi xurtî tavêjin, bi kurtî, weke gernasên kevnare ne

Gereke em bîdîn zanîn ko ew kurdên di rojavayê iran de dijin û lor ew eşirên koçerîn ko ji bermayê mîletên Hindoewrûpi mane û heta iro ji dijin û di mênin.

## ZIMANÊ KURDÎ.

Zîmanê kurdi ji malbata zîmanên irani ye, ji zîmanê farîsi, ef-xani, bîloci, îstîni, û hin şêwe û zaravên kavnare û nûjen derketiye. Lê zîmanê kurdi ne farîsiyeke devxwarî ye, belki zîmaneki serbîxwe ye. Destûr û qanûnên wi yê fonetîki û stetîki hene û grêbenda wi di gel farîsi, weke grêbenda navbera zîmanê surbî û zîmanê Rûsi ye, yan ji weke zîmanê Siwêsrî-Adî û Îtalî ye. Zîmanê Farîsi ji zîmanê pehlewî û farîsiya kevnare derketiye. Lê zîmanê kurdi nêzîki herdiwan ji nabî, û heta zîmanê Avîsta ji dûr ketiye.

Hîn bawer dikin ko zîmanê kurdi ji weke van şîweyên ko li iran nû derdikevin, yan derketine, ji zîmanê midi ko mîriye gotinên xwe sîtandine û Mîdiya ew mîletê kevnareye ko ferman-darî li Îran kirîye.

Gelek şîwe- zarav, di zîmanê kurdi de hene, çêbûne.

1-Şîweyê rajor Kermanşah, Senenduc.

2-Şîweyê rojhîlat Suleymaniye, Sawcîblax.

3-Şîweyê rojava Kurmancî ev şîwe bîgir li hemî Kurdistanê belav bûye. Lê weke ji gotinê dektor xeznedar tê xuyakirin ev gotina Minorûski dîrist nediye.

Kurdên rojava û kurdên rojhîlat zîmanê kurmancî bînav dikin herdû ji dibêjin zîmanê me kurmancîye, tevli ew ên ko bi zîmanê şîweyê kurmancî, li rojhîlat mîjûl dibînin gelek hindîkin, lê şîweyê xwe paqî hiştine, ji awayê gotinê ve.

Yek ji nîşanên newekheviya herdû şîwa eve ko kurdên rojhîlat dibêjin: Mîn zanîm, lê kurdên rojava dibêjin: Ez zanîm yan ji mîn nazanîm, ez nîzanîm. Ev herdû ji du gotinên eşkerene heta di wekheviya wan bi sîlavî re jî. Ji ber ko hemî ji yek kokê hatine.

## TORA KURDÎ

Di kurdi de tora mîli gelek dewlemende, çîrokên pîr û sîtrînan û şer, xesma şerê Dîmdîm ko dikevi rajorê Ormîyê û nêzîki çemê Bîrandûz e, ko Şah Ebbas hatiye ser vê kelehê û kurd ko dibêjin, gelek bi hînermendi û payedari û hêrz ev şerê ha tiştêki rast û dîrist di nav xwe de digri.

Weherange Mem û Zîn ko bi rîstîtin û hînan û nîvisin ji heye û tê gotin û li hemî Kurdistanê hatiye belavkirin.

Mem û Zîn du evîndarî û gelek ji hev hezkîrînin jî. tenê ji ber ko Mem ne ligora Zîn bû ji ber ko koka wan neweke hev bû, Zîn keça mîr bû û Mem kurê Debid bû, û çawa Mîr Zeynîdîn, Mîrê Bota bîvê dîketinê agahdar bû, Mem xîste zîndanê, lê dawî ji tîrsa mîlet ew berda û xuşka xwe lêmarkîr. Lê Mem di



zindanê de serê xwe dani û zin ji pîştî wi bi hundîki serê xwe dani û bihevî xistin gorekê û hin gulên sor û pîr li ser gorna wan bûn weke nişaneke ji evina wan ko ji mirinê ji xurtir bû.

## RIST Û HUNAN

Rist û hunan di nav kurdan de gelek fireh û pîr hatiye. Lê em nîkarin ristên ko ristevanên kurd çêkirine têxin nav ristên baş yê nîslamê. Tenê em dikarin bibêjin: Ji ber ko bi zîmanê xwe nexwendine, yan nexwedîna bi zîmanê kurdi, ev şop di nav zîman û ristên kurdi de hiştine.

Heşt ristevanên kevnare navdar û bi dengî Ciziri, di sedê yazde hê zayin de bû û ristên wi di sala 1904 de Hartman bi awaki Liyograf belav kirine û rojhilat nasan kesnêdi ko karîbi tercume biki. Lê di iro de bawerim ko ristên kurdi ji Suleymaniyê derdikevin, ji ber ko Nalî li Suleymaniyê diji.

Awirek: Minoriski ji weke hin hevalên xwe di tarixê Melayê Ciziri de şaş çûye, ji ber ko jina seydayê mezin di sedên 9-10 koçi de ye, eger ne di 8-9 de bi. Lê gelek diriste ko ji Belec-Şêrko, Emin Zeki, ev şaşî weke Secadi, sitandîbi.

Berê ewên dilûşk ko gotina Poşkin vegerin û bibêjin ko ev ristên rojhilat bêdaxwazî, ristên ristevanên me yê nîslamê ên rojhilat ne bêdaxwazî û ne hiçin lê hin nişanên ristê têde he. Tevli ko eşkereye, ristevaniya kurdi ne weke wê rîsta ko pîr nexweş û pûç ko wê paşiyê di hin rojnameyan de bi navê Neşidê kurdi hatiye belavkirin.

Gereke em bîdî zanî ko şîweyê Goranî di Kurdistana rajêr de gelek xurt û bîlnde heta di

ser farîsî re ye û kevnarekî wî kelasîkî heye û bawer dikin ko ne ji şîweyên zîmanê kurdi ye.

Hin kevnarekî pê hatine nivîsandin ko gelek navdar û bi dengî. Leyla, Mecnûn, Xusro-Şêrin, Xurşîdî -Xawer...

Gerokê Îngilîzî Rîç, di serê sedê borî de hin destnîvîsên kurdi ji van çîrokan dîne û bi xwe re birîne ko nîha di entîkxana birîlîni de hatine parastin. Her wekû min bi xwe jî, di sala 1914 de û di hundama Zîhaw de hin ji destnîvîsên nûjen ji van çîrokan û hin diji sitandine...

## ROJNAMA KURDÎ

Rojname kurdi ya pêşî bi navê Kurdistan di sala 1898 de hatiye derxistin û li Qahîre derçûye û paşê birîne Cînef, Ebdîrrehman beg kurê Bedîrxan paşa derxist.

Lê Dr Xeznedar li jêrê rûpel dibêji min rojname Kurdistan jîmara yekem di biroya xwendegêha mîletên Asya de dibin saya ekademiya zanîstî-Sovyetî de ye ko, li Petrograd Leningrad de çar rûpelî. Lê hin bi fransî ji pêve hatine girêdan û serokê nivîsvanê wê Medhet Bedîrxan e di 22 Nîsan sala 1898 de hatiye çapkirin.

Lê Minorûskî pêde dîçî û dibêji rojname diwem pîştî şorîşa tîrka û danîna sinor-destûrê derketîye û Şêx Ebdîlqadir ev rojname derxist, lê gelek nema û dirêj nekîr.

Dawî bîrek ji kurdan rojname Hêviya kurdi derxistin, kovareke mehane bi navê Roja kurdi paşê hate derxistin, ko ji wê kovare hin daxwazên kurdi perwerî dîhatin xuyakirin û li ser rîwê wê Ayina nûrovên kurden mezin, navdar datînin weke Sîlahîdî, Kerîm Xanê Zend û bir û bawer

rên kurdi perwerî belav dikirin.

Her weha Hetawê kurdi-Tava kurdi, di sala 1914 de hatiye derxistin, bawerim ko ev gelek belav dibû û min bixwe li Suleymaniyê ji zû de navê wê bihistîye. Di wê çaxê de fermandarên welêt û xwendevanên kurdi gelek li çîroka kurdi perwerî dibûne xwedî û jêre piropaganda û kar û xebat dikirin...

Olperestên protestant bi alîkariya civatên elmanî li Sawcîblaq-Mehabad di serê Şêrê mezin de kovareke biçûk bi navê Kurdistan derxistin û hin nivîsar di biwara destûr û awayên zîmanê kurdi de, di wê kovare de di nivîsîn û hin ji ristên kurdi ko ji nîvîştî Oskar derxistibûn, têde belav dikirin.

Li ser kurdi û zîmanê kurdi gelek nevisîn û tevli ko gerokên rûsî kolî Kurdistan geriyane û li ser kurdi nevisînê kêmin jî, ji wan: Baron-Budî, Çîrikof, Şemîrtof, Meksîmovîç, Xanîkof, F.F.Mayê fîskî, P.A.Tomîlof û hin di ji hebûn, lê em dikarin bibêjin: bi payedari û serbîlîndî bibêjin ko destpêka vexwendinê li ser kurdi ji rûsya derketîye.

Di sala 1797 de Akadîmî palas ferhengê mezin çêkirîye ko hemî zîman dane ber hev, ev jî li ser fermana împîratorê Mezin-Katrîna Mezin bû, ko di cara pêşîn de ye zîmanê kurdi 276 gotin ji digel zîmanên mayî hatîna danîn û nivîsandin.

Her wekû di wê salê bixwe de li Roma Marîzyû Karzonî rêzîmanê kurdi danîye ko haya herdu pêzanên mezin rûsî, îtalî jî hev ne bû û lihev rast hatine tenê ev herdu karên grînbîha, ko di yek salê de hatine çêkirin bîcîaniye.

Xebatî pîr Karzonî dixî destê

me ko dibêjm: ew bapirê vexwendin û venerina zimanê kurdi ye. Lê çawa venerina li ser kurd paşê berepaş çûye, tenê kara xwe didi mirovên vi kari, pêzanên ko xwe ji vi kari re valakirine. Lê hin tiştên ko li ser vi miletî hatine ditin, bûne weke ronahi û ketine ber çavên rojhatnasan.

Dî<sup>de</sup> 18 de me ew tiştên ko li ser kurd hatine nîvisandin ko xwe pêgirtiyên tarixine, ditine ko li ser eşirên kurd hatibûn nîvisandin. Bî wan hin ali ji jûngariya derebegên kurd hate naskirin û ronikirin ko di hin çaxên kevnare de bûn, kêmtîşt ji wan dizanibûn û ew tiştên me nîzandibûn, li ber çavên me hatin ronikirin.

Gerokê Îngilizi bî dijwari listak ji navên wan eşirên kurd peyda kiribû. Lê ew listeyên ko leşkerê rûsî xîstî destên xwe ji çêtrinê wan listan bûn.

Dî şerê Rûs-Farîs, sala 1828 de General Suxtelin bajarê Erdebîl xîste bî destê xwe û nîvîştîxana Sefewî de tişteki hêja kete destê me û me şande Petrograd-Lêningrad.

Ev tiştê giranbîha tarîxa Şerename bû ko xwepêgirtîyeke tarîxi navdare bî rasti tişteki gelek hêja û giranbîha ye, xwedî û çêkroxê wê Mir Şerexanê Bedlîsî dî sala 1599 de nîvisîye û pêzanên me gelek bî rûmet guh didane vê tarîxê û dîcara pêşî de ye, ko ekadîmî Vilyamînof, Zêrnîf hemî bendên wê ser çar perçan belavkirin ko pirê jîna xwe divî karê ha de rabîwardîye

Hîndama Semolînskî dî çaxê şerê Qerem de hin dil girtiyên Turkiya hebûn, ko hin ji wan kurd bûn. Ekadîmîya zanîstî Lîrx rêkure nav wan ko cara pêşî bû hin nîvisarên kurdi hatin belavkirin û ditin. Çawa ko du mirovên dî ko Mancîstêr bî wan

re bû li ser kurd mijûl bûne û xebitine.

1-Bîrîzin,

2-Dîtil, ko dî çîl salên sedê bori de çûne rojhat û ji van herduwan bêtir du mirovên dî li ser kurd xebitî ne, ko herdu ji qun silosên rûsîne, A.Xodîzko û A.Japa. Ê pêşî gelek evîndarê zanî û nasî bû, gelek gerîyaye û pîr nîvisîye, li Parîsê li yekî kurd xwedewar rasthatîye paşê bî zîmanê Fransî dî kovara Asya de nîvisarek lîser şîweyê Suleymaniyê, rojhat belavkirîye.

Lê êdî A.Japa, dî sala 1848 de-1866 de li Erzerom bû û bî şîweyê rojava mijûl dibû û hin xwendewarên kurd ji xwe dane tenîştî wi û bî hevî dixebitî û bî alîkarîya wan çend nîvisar danîne û ferhengeke kurdi-fransî çêkir û dawî ferhengeke mezîn kurdi-fransî-rûsî çêkirin. Lê ekadîmîya zanîstî herduwên pêşî belav kirin tenê guh neda herduwên pêşî û ne çapkirî hiştin. Ê ez bext sîpî bûn, yan xwe bextsîpî dibênî, ko mîn bî lihevîrast hatîne herdu ji girtî û xîstî destê xwe.

Dî sala 1913 de zarîwên A.Japa, hemî destnîvisên wi dane mîn û ezê xwe ji nihavî karbîkîm ko herduwan ji çap bîkîm. Lê D.R Xezendar li Jêrê rûpel dibêjî: Minorûskî ev herdu ji çap nekîrîne, jî ber ko zû jî Rûsî-Sofiyatî derketîye û heta niha jî hêj dî nîvîştîxana A.Japa de ko dî Ekadîmîya Sofiyatî de hatîne parastî.

Dawî profesîr Begyazarîf li ser kurdên Rûsya nîvisarek çêkir ko kurdên hîndama Yerîvan dî nav xwe de digrî û dî heftê salên sedê bori de çêkirîye, jî bîçûkî dî bî kurdi mijûl dibû jî lewra karîbû hin tiştên hêja nasbîkî û bî nîvisî. Jî derve jî bawerîya xwe bî xebata pêzan û hozanên rûsî ko li ser kurd nîvisîne tînin, jî lewra dibînin ko kar û

xebata pêzanên Almanî yostî, Bîrîm Sostî û tiştên ko Makaşê Nemsawî, çêkirîne dane ekadîmîya me ko çap bîkî û bîvî rengî hemî karên bikêrhatî ko lîser kurd hatîne nîvisandin li cem me li Petrogradî.

Tiştêki hêja heye ko em bîbêjî ew jî ewe ko dî van çend rojên raborî de, almanî xwestîye ko vi karê mezîn bîxî destê xwe û jî destê me rûsan derxî ko pêzanê Almanî Oskar Man, bî alîkarîya Împarator Eîlhelm çar salan li welatê farîs û Turkiya gerîya ye û kurd dane reveşka xwe û li ser wan hûr û kûr nîvisîye ma ev xwe êşandin paşdemayî dî çîroka kurdi de ne destdîrêjî ye?

Lê nûtrê tiştên ko lîser zîmanê kurdi hatîye nîvisandin rêzîmanî kurdiye, ko Sonê Îngilizi dî sala 1913 de çapkirîye, ev nîvîştî gelek bikêr û çêkroxê wê miroveki kesnedî ye çaxekî dîr û dîrêj Kurdistan rajêr bî dîzî, veşartî, dîbîm navê bezîrganekî Farîsî de li Kurdistanê rûnîştîye. Ê dî iro de Orbîlî xwe pêktîni, ko dî Ekadîmîya Petrograd de dersên kurdi dibêjî û em hêvî dikî ko hevîsarê xebata li ser mîletê kurd bî destê kesî dî vê bernedî û dî destekî rûsî de bîmîni, bîhêlî.

Dr.Xezendar, jî me re Orbîlî dîdî zanî û nasî: Ekadîmî Yûsîf-Ebkarovîç Orbîlî dî sala 1961 de li Leningrad-Petrograd de serê xwe danîye û dî sala 1887 de li Leningrad-Petrograd çêbûye jî çîl şagîrtî bêtir kurdî lî welatê Sovîyetîstanê belav kirîne û wi perçê kurdi dî zanîngeha Leningrad-Petrograd de vekîrîye û bî xwe bûye serokê perçê kurdi û dî nivê pêşî jî sedê bîstem de dersên kurdi gotîne.



# JI ME RE BERNAMA DESTPEKI DIVÊ

Hesen Mizgin

Bî rasti nivisa "Bernama Mamosteyên Kurd" ji ali destpêka raberzîna hindekariya kurdi ve baş bû. Ez hêvidarim ku her mamosteyê ku bî kurdi ders dida, bîkeve vê raberzîne. Bî vi awayi em dê karîbim ji bo bernamekê werin ba hev. Ev yeka ha gelek giring e Divê bî awaki ev problem bê te bîşaftinê. Dî sala 1982'an de, bî Pêşengiya Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê, mamosteyên kurd hatin ba hev. Armanca damezirandina "Komela Mamosteyên Kurd li Swêdê" bû. Hêvi ew bû, kû mamosteyên kurd bêne ba hev, ji xwe re bernameki çêkin, hem ji ali Pedagojiyê, hem ji ali metodikê ve riyên hêsan bîafirînin. Ne ji xwe ku me mamosteyên Kurd, li ser van tiştan nexebîtin, tu kes van tiştên giring danayne ber me. Divê em bî xwe ser van tiştan kar bikin û riyên hêsan bî afirînin. Lê belê xebata damezirandina komelekê ji hin sedeman têk çû. Problemên me gelek in. Helkîna wan probleman wext distine. Problemê bî peydabûna xwe nayê bîşaftinê. Kurdên Sovyetistanê bî sistemê mirovperwerî û sosyalistî problemên xwe yê netewî bîşaftine. Lê belê dema mirov tê ser dersdariya bî zîmanê kurdi, mirov dibîne ku ew vê problemê li gor xwe bîşaftine, ne li gor kurdên Tirkîyê an ji yê Iraqê. Armanca min lêkolîna wan probleman nîne. Jî vê yekê ji ne pêwîst e, ku mirov kûr bike. Lê tim tê gotin: "Ne heyran tu otorîteyek ji bo kurdi tune ye. Hema her kesê ku radîbe dibe pîsporê zîmanê kurdi. Ma ev wê heya kengê dom bike?" Ma gelo ev gazin bî ci ne, yan na? Ez bawer im, ku hinek ji van gazinan dî ci de ne. Divê mirov xwedî mesuliyet be, xwe bî xwe bîwezîne. Bî navê pîsporî hin tiştan bîla tevliheve neke.

Heval Rohat ji bî pîsporî deketiye rê û bernamekê pêşkêş me kiriye. Min bî hewes bernama wi xwend. Heval Rohat dibêje; "Dersdar-mamosteyên zîmanê kurdi cara pêşin pêwîst zîmanê kurdi baş deng bikin (bîpeyvin), rast binivîsin. (Berbang 1/84 r.15). Ma gelo heval bala xwe daye rastnivîsandina kurdi? Bî awayê ku ew dinivîsîne ne rast e. Berê her tiştî heval Rohat lêkara "bûn" (to be -ing, att vara -Swêdi) bî derbeki avêtiye. Kurdi zîmanekî Hind û Ewropî ye. Lêkara "bûn" tim bî serê xwe tê nivîsandinê. Wek; Ez im -Kurdi  
I am -Ingilizi  
Jag är -Swêdi  
Lê xûya ye heval dixwaze vê çeydeyê ji ortê rake. Ez ne bawer im ku şaşîtiya tîlîvîsê be. Jî ber ku ne yek e, ne didu ne, ne jî sîsê ne. Em werin ser 'Bernama' heval Rohat. Ma gelo ew vê bername bî çî awayî çêkiriye? Gelo ev "bername" bernama zîningeha pedagojiyê ye, yan zîningeha lingiwîstîkê ye, yan jî zîningeha diroka edebiyata kurdi ye? Min tiştêk jê dernexist. Em jî "zîmanê kurdi û Gramatika wi" destpêkin. Wîha dibêje; "Heta nîha hemû zîmanên cihanê çawa pêşta çûne, guherîne û hatîne gîhiştine van rojên îrojin?" De were jê derxe! Rebeno mamosteyê kurdî ku û lingiwîstîkî ku! Guhertina zîmanên cihanê li gor hin bîngehan tîne kolandinê. Ma bername ji bo gîhandina filologan e? Ev karê ku heval daniye ber me ne karê mamosteyên kurdan e. Ev, karê kesê ku lingiwîstîk an jî jî famîlya zîmanan grubek dixwîne, ye. Ez minayek bîdim; Eger ez bîxwazim zîmanên Îrani bîxwinim û divê ez jî bîl kurdi û farisî hin zîmanên din jî bîxwinim û guhertinên van zîmanan bî diroki fêr bîbim. Ev kar û karê ma-

mosteyîya dibîstana destpêki ne wek hev in. Her wîha bendên a, b, c, û d dî rûpela 16'an de dikeve xwendina filolojiya zîmanê kurdi.

Em werin ser "Literatura kurdi". Heval wîsa kiriye, ku mirov dibêje çey em dê diroka edebiyata kurdi bîxwinin. Bî rasti heval hin tiştan gelek sîvîk bîşaftiye. Ma gelo ew baweriya xwe jî tiştên ku nivîsandîye tîne? Literatura kurdi ku ew daniye ber me, bî serê xwe beşek ji zîningehê ye. Her wîha dî "efrandînen zargotîna (folklor) kurdi" de bendên a, b, c, d beşên edebiyata geli ya kurd in.

Jî min re wîsa xuya ye, ku heval bernama zîningeha filolojiyê yan jî ya îstîtûya hindekariyê raste rast guhertiye kurdi û daniye ber me. Ji me re bernama filolojiyê jî divê, lê nîha ya ku ji me re pêwîst e, bernama hindekariya bî zîmanê kurdi ya dibîstana destpêki ye.

Heval Rohat, li ser gelek tiştên giring jî rawestiyaye, weke pîsêna pedagojiyê. "...dersdayin karê herkesî nîne û jî destê herkesî nayê, ew pêşeyê". (Berbang 1/8 r.17) Ez jî bî te re. Ew bendên ku jî ali pedagojiyê hatîne nivîsandinê tev de dî ci de ne. Ez wîsa bawer im, ku heval tenê li ser van tiştan binivîsanda me jî hev xweştir fê m dikir.

Heval Rohat "bernama" xwe tevlihev kiriye. Armanca wî eger bernama zîningeha zîkmakî be, ew tiştêkî din e. Wê çaxê jî metoda çêkirîna bernamekê ne wek ya heval e. Dî nav Kurdan de kesên ku zîningehan xwendinê û bî salan mamostetî kirîne hene. Divê beri her tiştî ew bêne ba hev û xebata bernamekê bikin. Ev jî beşek giring jî vatîniyên Federasyonê ye. Bî a min berê ku ev "bername" jî redaksiyona Berbangê derbas be, diviya bû, ku jî Komîta karger derbasbûna.

# BIRINDAR Û ÇAVÊŞ

Ahmet Cantekin

Ro hêdi hêdi li paş çiyayên gund heldikîşi jor. Şivanê gund ji, zû de ve pezê gund dabû pêşiya xwe û kûçikê boz, xwe ji geliya de berdida jêr. Tozeke zırav li dû pez radibû bani... Gundi bî karê xwe yê rojin ve mujûl bûn. Yê n ku zilgo çêdikirin, yê n ku kuşkur çêdikirin, axûr paqış dikirin, mırışk ji pinê berdîdan, yê n ku dew dikıyan.

Deng bî gund ketibû ji bo jineke nû. . Jî bo rojeke nû...

Kut û kuta ku ji meşkên dew dihat, dengê mırışkan û bangkirina dikan, hew-hewa kûçikan xwe tevli dengên çûk û teqû reqa feran dikirin. Zarok hêdi hêdi ji xew radibûn. Birindar ji ber ku çava ziç girtibûn, nedikari bibine. Jî bo vê bani diya xwe dikir. Dê ji li hêla axûr binê dewêr paqş dikir.

Xuşka Birindar zelal ji dew av dîda. Diya Birindar Gulistanê ji Welat re gottibû. ku dema tu ji baxçe tēyi, bî xwe re balcan û isot bine ku em firavîne çêkîn.

Qar qara Birindar dom dikir...

Çav bî ziç bûn û ji ber vê ji ne dikari dinê bibine. Belê, bî xwe dikari çavê xwe bişo, lê rê nedibir ser mısîne avê...Heke ku bizaniya musîne avê li kû ye, wi

bî xwe dikari çavên xwe bişo.

Birindar dıgiri ha dıgiri...

Çend cara bang kîr, dayê... dayê... jî ber ku diya wi li axûr bû, nedibihist. Banê bavê xwe ne dikir ji, wi zanî bû ku bavê wi ne li malê ye. Dema ku Birindar ji xew radibû bavê wi li nav baxçe bû. Baxçê xwe av dîda.

Kûçikê wan ku navê wi Hırço bû hat ba Birindar.Li Birindar nihêri. Kûçik demeki kurt li Birindar dinê hiri, bes ku deng jê derê... Bî dû re kûçik boçika xwe hêdi hêdi pişt û zikê Birindar dîda. Kûçik nedixwast ku Birindar bigiri. Ku wir nebûya, çîma, çîma kûçik ê bihatîbiya. Hem ji boçika xwe hêdi hêdi di birindar bîda. Hem ji wek ku mız bîde...Nermik-nermik, Xweşik-xweşik...

Birindar ji wi girt hambêza xwe kûçik rê bîr (Birindar kûçik hambêz kîr). Edî Hırço di hambêza Birindar de bû.Hırço fê m kîr kû Birindar alikariyê dixwaze. Birindar ji nav ciha derketi bû. Gaveki pêş de li pê hambêza xwe Hırço re biribû û dıgiri. Jî hundîr deng nedihat derve... Ne dıgihêşt diya wi û ne ji xwişka wi.

Bî dûre Hırço xwe ji hambêza Birindar filîand û baz da derve. Bazdana hewşê û hew-hewa wi bû yek. Hırço berê xwe çex Zelalê kîr. Serê xwe rakir jor. Bî dû re çend bî dangan kîr hew û hew. Zelalê li hêla hewşê nihêri. Weki ji Hırço re bêje te xêr e...Ew çî hew û hew e?

Hırço çavê xwe çet li ser Zelalê ranekir. Her ku diçû dengê xwe zêde dikir. Zelal ji silimê dihat jêr. Hat hewşê. Dema ku ew dihat, Hırço ji baz da hundîr. Zelalê dengê Birindar dibihist. Fê m kîr ku disan Birindar rabûye. Çav ji ziç girtine û nikare derê derve.

Çavên Birindar diêşin. Jî ber vê ziç girtibûn. Çavên Birindar pîr xweşik bûn. Reş bûn. Wek zeytûnan... Bavê Birindar porê wi bî meqesê pîr kurt kur kiribû. Dî havîne de sol (êmeni) nedikirin lingên xwe. Jî ber ku here-were, bî tenê cotek solê wi hebû. Eger ew ji zû Bıçetiyana hewce bû ku bavê wi coteke nû bikire... Ew ji zahmet bû.

Rewşa mala Birindar çet ji ne baş bû. Hêlê abori de hebûna wi pîr hundîk bû. Erdê wi bî hemû parçeki piçûk bû. Lê axayê gund û melayê gund xwedi mal bûn. Mal û mulkên belengazan bî zorê zept kiribûn. Xıstibûn bin destên xwe yê n qreş û wan keda mîlet dixwarin. Keda gundiyan hemû dixwarin. Gundi ji wan re digotin 'kedxwar û xwinmij'.

Zelalê Birindar ani bû derve û çav şuştibûn...perçak nan dabû dest. Birindar li ber diwar û li ber beroşkê bû. Hırço ji li nik (ba bendê) hevalê xwe rûniştibû. Jî ber ku dinya (ba hewa) germ bû, li ber pozê Birindar vîz û vîza mêşan bû.

Heta ku çav xweş nebîn, Birindar dê vê êşê bikişîne.

# BÊ EDEBÎ

Dr. Poloço

Peyva "bêedebî" li hin hêlên Kurdistanê maneke pir nebaş û kirê t dide. Kesên ku rabûn û rûniştina wan ne bi usûl bin, zimandirêj bin, derewan bikin, xwarinê bi çelpeçelpî bixwin, vexwarinê bi firîfî vexwin, li hevalên xwe guhdarî nekin, bi kurtebirî kesên ku tiştên xerab, nebaş û kirê t dikin, ji wan re "Bêedeb" tê gotin. Peyva "Edeb" ji erebî tê, yanî edebiyat lê peyva edebiyat, îro ne tenê ji aliyê ereban de, her wisa ji aliyê tirk û farisan jî tê bikaranîn. Li nik me kurdan di van demên

dawî de her çiqas jî dêvîla edebiyatê tiştin din bêne bikaranîn jî, her edebiyat e, û bi a min em peyva edebiyatê neguherin û weke cîranên xwe bikarbin hîn çêtir e. Mana edebiyatê ew e, ku mirov raman û

nêrînen xwe bi huner bikarbin. Ji tiştên hunerî yê nivîsandî re jî "edebiyat" tê gotin. Edebiyatê di her dem cîvatan de roleke mezin û berbiçav leyistî ye. Dema ku em îro tê de dijîn jî rola wê pir mezin e. Nemaze ji bo gelekî weke gelê kurd, ku bi sedsalan di bin saw û tirsê de, di bin zordestî û stemkarîyê de û

her bi nîvzimani jîya ye, roleke hîn mestir dileyze.

## XWENDINA EDEBÎYAT LÎ NIK ME KURDAN

Îro ku mirov rabe di nava kurdan de statîstîkê çê bike, mirov dê bibîne ku hejmarek pir biçûk edebiyatê dixwînin. Hewesa xwendina edebiyatê li nik me kurdan pir kê m e. Em roman, çîrok, helbest û pîyesan pir kê m dixwînin. Ji ber vê yekê jî em ji tiştên kulturî pir bi dûr dikevin. Çûyîna sînema, tîyatro û konserên musîkê li nik me kurdan pir kê m e. Hîn ji pir kesan weye ku yê diharin sînema, tîyatro û konseran tolaz û pêxwas in. Ev yeka han rojekê bi serê min de hat. Êvarekê li sûke ez li hevalekî rast hatim. Weke her car me silav li hev da, destên xwe da hev û li rewş û karên hev pirsîn. Dû re hevêl jî min pirsî:

-Ma tu ê bi ku de herî, lo!  
-Ez ê îşev herime tîyatroyê, ma tu jî nayê?

-Tiyatro? Tu ê here tîyatroyê çî?

-Wele îşev pîyesek xweş e, ji romana Dostoyevski ya bi navê Sûc û Ceze çê kirine.

Hevalê min milê min kişand û got:

De haydê lo, em herin ji xwe re bîskê li çayxanê rûnin û bipeyvin. Tu ê herî tîyatroyê çî?

Di binê peyva wî hevalî de pir tişt radizan. Wî xwe zane, hişyar û birewer didî. Ez jî di wê deqê de tolaz û pêxwas didîtim. Xwest ku alîkarîyê bi min bike û min ji ser rîya çewt vegerrîne.

Lê min destûr jê xwest û got: Li min bibûre, lê divê ku ez pîyesê nêrvînim. Ez îşev bi nêta wê derketime.

Hevalê min kenîya, serê xwe hîl kir û got:

-Hinan ji min re digot, ku tu dihari sînema û tîyatroyan min bawer nedikir, lê bi rastî jî wilo ye ha!..

Erê wele, wilo ye, ez çî bikim? ..

Min xatîr jê xwest û ez bi gavên giran û bi dilkulî ber bi tîyatroya xwe ve meşîyam.

Ev e, Bêedebî, bêkulturî ye jî. Lê divê ku em ne bêedeb, ne jî bêkulturî bimînin. Divê ku em bixwînin



# Peyuên Nivîskarên Naskirî

*Firat Cewerî*

Peyayên mezin ew in, ku guh nadin mezinahîya xwe.

Shakespeare

Em nizanin ku em ê çi bin, lê em zanin ku em çi ne.

Shakespeare

Ne bi deyn bide, ne jî deynan bike, an na tu ê hem hevalê xwe, hem jî perên xwe winda bike.

Shakespeare

Hevalê xwe jî min re bîbêje ez ê jî te re bîbêjim tu kî ye.

Cervantes

Helbest dostê tenê tîyê ye.

Cervantes

Tîşteki ku wê di pêş de tadeyîyê bide te, tevî jîna xwe meke.

Emîle Zola

Pîrek bêhêz in, lê dayik bi hêz in.

Emîle Zola

Îlm malê hemû dinyayê ye, ti-xûbên welatan nas nake.

Goethe

Jîne bê fêde mirineke zû ye.

Goethe

Talûka mezin di navbera bêaqil û kêmaqlîyan de ye.

Goethe

Yên ku ne azad bin û weke azadîn, xwe nîşan bidin, ew koleên herî mezin in.

Goethe

Lîstîkvanekî ku perê wî hebe ne naman, ew ê telegrafan bişîne.

A. Çexov

Aqilek baş e, lê du aqil hîn baştirin

A. Çexov

Ji jînê metirsin zarokno! Gava ku hun tîşteki baş û hêja dikin, jîyan çiqas xweş e!

Dostoyevskî

Yên ku ji zarokan hez dikin, jî jînê ji hez dikin.

Dostoyevskî

Ji bo hînkirina gelekî sê tîşt lazîm in dibistan, dibistan, dîsa dibistan.

Tolstoy

Yên ku ji bo hinin din bigirîn, jî çavan dibin.

Tolstoy

Bahwerî hêza jînê ye.

Tolstoy

Di dinyayê de tîştên ku ez dixwazim û yên ku jînê bi min hezkirin dide du tîşt hene: Evîn û azadî. Dî ber evîne de lazîm be ez ê jîna xwe bidim, lê di ber azadiyê de ez evîna xwe jî feda dikim.

V. Hugo

Felsefe mîkroskopa ramanê ye.

V. Hugo

Pîrtûk sar in, lê destên ku mirov baweriya xwe pê bine ew in.

Tu tişt weke derewan mirovan  
biçûk nake.

Anton Çexov

Mirovên nefsbîçûk tu caran qa-  
la xwe nakin.

La Bruyère

Ger ku mirov baş bala xwe bide  
wan kesên ku kesî napesînîn,  
naecibînin û her bi nebaşî dev  
tavêje wan, mirov dê bibîne ku  
ew jî ji aliyê kesî de nayê ne  
hezkin.

La Bruyère

Devavêtin pirê caran ji bêaqi-  
liyê tê.

La Bruyère

Li cem hunermendekî, ku mirov  
hunermendekî din, ku di dereca  
wî hunermendî de, wî  
zêde mezin bike, bê terbiyetî  
ye.

La Bruyère

Her tişt tê guhertin, lê tu tişt  
winda nabin.

Ovidius

Cesaret di ser hemû çekan re ye.

Ovidius

Dijminên we yê herî bi hêz di  
nava we de ne.

Mehemed

Gelî dostan, di dinyayê de dost  
tune ne.

Aristoteles

Bawerî dewama ê qîl e.

W.Adams

Pirtûk zarokên mêjî ne.

Swift

Mezindahîya peyakî mirov kare  
di nevsbiçûkahîya wî de bibîne.

J.Ruskîn

Gelo ma hun dixwazin ku bila  
her kes bi başî pesnê we bidin?  
wê çaxê pesnê xwe nedin.

Pascal

Yên ku baş bi zimanê xwe ni-  
zanibîn, hîni zimanên din jî na-  
bin.

G. Bernard Shaw

Rexnekirin hêsan e, senet zor e

Dostoncher

Pênûs ji şûr jî bi hêztir e.

Bulwar Lytton

Yên ku dinyayê fîdare dikin pê-  
nûs hubir û kaxiz in.

James Howell

Ger ku دنیا vekirî û rohnî bi-  
wa, senet çê ne dibû

Albert Camus

Di دنیا din de ji nivîskaran re  
dujeh (cehenem) tune ye. Ji  
xwe tiştên ku ew di vî dinyayê  
de ji destên rexneger û perpirst-  
yaran dikşînin bes e.


Bovve

Gunehê pîrekan, bi peyayên ku  
ew jê heznakin çet nayê.

Alexandre Dumas

Peyayên dîrokê yê herî mezin,  
yê herî feqîr in.

Emerson.



M. M. Ste

www.ksars.org



BERBANG  
TUNNELGATAN. 14, 3 tr.  
111 37 STOCKHOLM

MASSKORSBAND

[www.arsivakurdi.org](http://www.arsivakurdi.org)